Newroz Hejmar (71) Rûpel (8) Çirya Pêşîn 2006z – 2618k

Kampina piştgiriyê ji bo sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê – yekîtî -

Wîdad Akrawî

widad.akrawi@woea.dk-www.widad.org
Fax: + 963 11 332 3410

Ta niha birêz Mihyedîn Şêx Alî, sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ji /20/-î Berçile 2006-an de wenda ye, rewş û çarenûsa wî ne diyar e. Ji ber ku, aliyek parastinî ji rijîma Sûriyê ew girt. Tirsek heye ku, bidin ber işkencê û danstandinek nemirovatî û nizim, an jî cezak hişk di dermafê wî de bê standin.

Ev li pêşa birêz Mihyedîn Şêx Alî ye, bi ser ku, Sûriyê sala 2004-an tevlî peymana rikberiya işkencê (itîfaqiyit Munahedit elte,izîb) bû ye.

Roja 25/12/2006, kebaniya birêz Mihyedîn Şêx Alî berê xwe da Şaxa parastinî ya leşkeriyê li bajarê Helebê, da ku, li rewş û nûsa wî bipirse, lê wan înkar kirin û li xwe nenan, û ji wê xwestin ku, li ciyekî din lê bigere, bêyî ku, jêre xuya bikin li kû û çawa.

Ta niha ne diyar e gelo dadgehê ti sûc û gunehkarî raberî rêzdar Şêx Alî kiriye yan na, lê bi texmîna me, girtina wî yek ji van girtinên dawiyê ye.

Çalakiya em pêşniyar dikin ewe ku nameyên piştgiriyê bi leztirîn dem ji berpirsên Sûriyê re bêne hinartin, di wan de bê xwestin yan birêz Mihyedîn Şêx Alî bispêrin dadgeheke xweser li gora pîymanên navdewletî û prensîpên "peymana navnetewî a parastina mafên sivîlî û siyasî" a ku dewleta Sûriyê yek ji endamên wê ye, yan jî, bê derengî ew serbest bête berdan.

Hêvî ewe ku, Name çap bibin, imze û navnîşan li ser bên danîn, û paşê li ser navnîşan an Faksa pêre, bên şandin ji:

1. Rêzdar Beşar Elesed – serokê komara erebî ya sûrî.
2. Rêzdar şalyarê kar û barên derve.
3. Rêzdar şalyarê dadmendê re, li ser navnîşanên jêrîn bişînin.

Digel sipasî û rêzên Wîdad Akreyî

****

Kovar û Malperên Kurd piştgirya birêz M.Şêx Alî dikin

Munteda Nûredîn Zaza . Kovar Dicle ya bi zimanê Kurdî û Erebî . Kovara Hîwar ya bi zimanê Erebî . Saziya parastin û fêrkirina zimanê Kurdî li Sûriyê . Kovara Pirs ya bi zimanê Kurdî . Rojnama Newroz ya bi zimanê Kurdî . Weşana siba ya bi zimanê Kurdî û Erebî. Kovara Perwan ya bi zimanê Kurdî û Erebî . Rojinama Wîfaq ya bi zimanê erebî. Kovara Berbang ya bi zimanê Kurdî û Erebî. Rojinama Deng ya bi zimanê Kurdî û Erebî. Rojinama El-Wehdê (Yekîtî) ya zimanê erebî. Yekîtî ya Kurdistan a ragihandina iliktironî. Rojnama Kurdistan ya rojane. komîta çalakiyên kurdewarî. Kovara Alxetwa. Malpera WWW.rojakurd.com . Rojnama Azadî – partiya Azadî a kurd li Sûriyê. Komîta Celadet ya fêrkirina zimanê kurdî – Amude . Malpera Efrin-net. Al-Hakikah Newspaper. Komîta rêvebir ya Alnidai ya bi zimanê erebî. Malpera **www.kurdax.net**